

Kurdocide Watch



Çawdêrî Kurdosayd

www.kurdocide.com

Kurdocide Watch focuses on genocide and human right matters in Kurdistan

Former Center of Halabja against Anal and Genocide of the Kurds - CHAK

12 Çileyay Pêşîn 2009

Divê terora "Anayasa Mahkemesi" bê rawestandî

Dadgeha Qanûna Bingehîn ya Turkiyê- "Anayasa Mahkemesi" biryara girtina DTP da. Her wisa mafê 37 polîtîkarên DTP yî ku bi siyasê mijûl dibin, ji holê rakir. Partiyên neteweperest û jenosîdxwaz "CHP" û "MHP" piştgiya biryarê dikin. Li Turkiyê, Kurdistanê û gelek welatan li dijî biryarê dengên nerazîbûnê bilind dibin...

Biryara "Anayasa Mahkemesi" ya li dijî DTP ê ne bê bingeh e. Hêza xwe ji mentala "Kemal" û piştgirên wî digire. Li Turkiyê hejmarek qanûnên bingehîn, li ser mentala "Kemal" ava bûne. Baweriya "Kemal", şiyarbûn û rêxistina Gelê Kurd ji awira netewî ve, xeter dibîne. Ji bo ku rê li ber xebata demokratîk ya Kurda bête girtin, bi qanûn, dezgehên fermî û nefermî xebat dibe. Windakirin û qetilkirina siyasethavên Kurda, beşek ji "terora ne fermî" ye. Partiyên mîna "CHP" û "MHP", dezgehên mîna "Anayasa Mahkemesi" û beşek ji bendên Qanûna Bingehîn yê Turkiyê û hwd, berde wama mentala "Kemal" garantî dike. Divê şahadeta Seyid Riza, Şêx Seîd, Mûsa Anter û girtina HEP, DEP, HADEP û DTP ê, muameleya neînsanî bi giştî li dijî girtiyên Kurd û bi taybetî li dijî rêvebirê PKK ê Evdile Ocalan di vê çarçoveyê de bê nirxandin û dîtin.

Hetanî beşek ji Qanûna Bingehîn ku ji cuntayên leşkerî mane, neyêne guhertin, azadiya rêxistinî ji terora "Anayasa Mahkemesi" rizgar nebe, partiyên mîna CHP bi şêweyekî ciddî neyêne şiyarkirin, nasname û mafê Kurda bi rêyên qanûnî neyêne parastin, gavên cidî ji bo parastin û pêşxistina çand û zimanê Kurdî û nasnameyên din neyêne avêtin, demokrasiya li Turkiyê nikare berepêş here. Divê dezgehên însanî û polîtîk yê cidî vê rastiyê bibînin, û li ser pîrsa pêşeroja demokrasiya Turkiyê û parastina mafê Netewa Kurd kur bibin û gavên pir cidî bavêjin.

Pêşketina Demokrasiyê li Turkiyê erênî ye. Lê tasfiyekirina polîtîkarên çalak û partiyên siyasî yê Kurda, xebatên hêzên Turkiyê di bin navên cewaz ji bo "çareseriya Doza Kurd li ser bingeha mentala îslam/Turk" bi xeter e, nikare bê pejirandin. Prosesa demokrasiya li Turkiyê, bi baweriya hêzên polîtîk yê Kurda û PKK ê, û beşdarbûna wan, dikare bi ser bikeve.

Bê guman e ku DTP dê rêyên nû ji bo berde wama xebatên demokratîk peyde bike. Lê biryara "Anayasa Mahkemesi" destpêkek cidîye ku berê Kurda bide alternatîvên li derveyî "Ankara" yê. Biryar dê hêzên Kurda mecbûr bike ku nêzî hev bibin û hevkarîya xwe xurtir bikin.

Em piştgirên xebata demokratîk ya Kurda ne. Li dijî terora "Anayasa Mahkemesi" ne û biryara wan bi hişkî protesto dikin.

- **Kurdocide Watch-CHAK Komîteya Karger**
- **Kurdocide Watch CHAK-Bakur & Kurdocide Watch CHAK- Swêd**
- **EuroKurd Human Rights-EHR**